



# ZENGİL

zengil zengil e,  
çi bike li cî ye!


Sal:1 hejmar:1-2  
Tîrmeh-1985

xwedî: geşredîn  
berpirsiyar: aladîn  
çapxane: rûknedîn

organa komita navendî ya rêxistina TENGEZAR

## YEKITÎYA MILÊ RAST SAZ BÛ!

- DU REBENÊ KURD BÊ KELEK LÊ AVÊ SIWAR BÛN.
- HESPÊN ŞÊ Ê ROJEKÊ BÊNE HAWŞÊ!





## ZENGİL

zengil zengil e,  
çi bike li cî ye.

□

Kovara Qerfa

□

Ji du meha carekê  
derdikeve. An dertê  
an dernayê.

□

**Berpîrsîyar:**  
TENGEZAR

□

### Redaksiyon:

Serdar SAMÎ  
Heval HEVAL  
Bêkes HAWAR

□



0920/ 97 206

### Navnîşan:

"ZENGİL"  
Amanuensv. 4/320  
104 05 Stockholm/Sweden

### "ZENGİL"

Post Box 7031  
63 07 Spånga/Sweden

Kurdiskt skämt tidning++  
Redaktion:S.Sami,H.Heval,  
B.Hawar++Adress:Amanuensv.  
4/320,104 05 Stockholm++  
Post Box7031,63 07 Stock.++

## ZENGİL-ZENGİL

Deng şêrîne, weke şekire  
Deng xweşe weke bilbîle  
Zengile, zengil  
Çêdibe ji pola, ji hesin  
Ne di rizî, ne dimire  
Tê kirî naye firotinê  
Peyda nabe li erda  
Nayê dîtin li ezmana  
Dikeve stûwê berana  
Dikeve stûwê nêriya  
Şivan û gavana  
Ji xew radîke...



## BEXÇÊ GULAN

Kanî pir bûn avên wan gûr  
Bexçe tije hemû tev gul  
Kes nebû xwedî guh nedan wan  
Ji bê av bûn tev de hişk bûn  
Yên bexçê gula xwest  
Wext lê nedî  
Ji kahwe û komela derneket  
Wan jî nedî tu şîneyî tu gul

Bexçe gula kesî ne avda  
Ne jî tevirdan  
Wana tevrik dan zarokan  
Zarok nezan erd kolan  
Qurmê gulan wan tev şikand  
Heta mezin pê re gihan  
Gul hişk bûn bexçe wêran  
Aqlê bavan hat serê wan  
Lê gul tev de hişk bûn  
Tişteke nema li meydan

Bexçê tijî hemû ji fêkî  
Bexçewan ne xwar neda kesî  
Nahtorî nekir ne bû xwedî  
Waş derketin ne hiştin fêkî  
Yên maî jî tev perpitîn  
Hevî heye ger em bijîn  
Bexçe dîsa tev bikin şîn  
Sûndê di xwin  
Bi navê Nanxurê Cilqetîn...

### "Gelî Kurdan!

Heke hûn naxwazin ji hev  
taromar û wînda bibin, berî  
her tiştî, zimanê xwe bixw-  
nin û bidin xwendin.

Lê heke dixwazin xwe nas  
bikin û xwe bidin nas kirin û  
hezkirin; û bi hevalti û do-  
taniya mîlêten din re pêş  
herin; û bi rûmet û serbilind  
bijîn, dîsa zmanê xwe bixw-  
nin û bidin xwendin."

## DÎ NAVA VÊ PIRANIYÊ DE ICAR ZENGİL JÎ

Baş e ji bo çi?

Êêê, ka bipirse, bipirse ku, tu fêr bibî.

Erê, di nava vê piraniyê de, em jî dest bi lêxistina tembûrê dikin. Em jî dikevin nava karwanên xwedî çarşefên reng bi reng. Bi xêr û xweşî be. Em nabêjin bila rehma yâzdanê pak lê bê.

Adet e, her kesên ku, bi kovareke nû dikevin nava koro yê pêşî pîrsa "ÇÎMA" dipirsin û destpêkirina xwe bi taybetiyên bingehîn dikin. Rûpelên xwe yên pêşî bi mêjiyê rastîn dinivîsin...

Qet netirsîn, em ne jî wan nanxurên cilqetîn ên ku, hûn nas dikin. Ê ! başe heyrana çavên we ma hûn çine?

Hêrs nebîn heyran! Emê jî kîskê xwe valayî erdê bikin û gotînen xwe bêjin.

Em dixwazin qerfa (henek, devavêtin) bikin, qerf. Qerfên reş. Xwe dewlemend û hînekî jî çandîya xwe ya qerfîtiyê ber û pêş bibin. Emê rahijîn mirov û bi taybetî "ronakbîrên xwe, ku kêmasî û li paş xistinên wan û bi koma bûyerên wan yên emelî (pratîkî) hene. Em dixwazin di dema jîyana wan de kêfxweşî û kulên wan binivîsin û deynîn ber çawan. Bi vê re jî emê li gora adetan, li ser koledaran jî hîn tiştan binivîsin. Jî qerf û henekên dinê jî em we bê par nahêlîn. Lê tiştên ku bêhtirîn li ber me ne û me kiriye, armanc em bi xwe ne. Jîna me biyanîyan û ronakbîran, hebûn û giranbihayîya me ye. Welhasil, emê tîmî derziyê di çavên xelkê û şûjinê di çavên xwe rakin. Ji xwe pîrsa me jî ev e, nivîsandin, kirin û xêzkirina wê ye...

Em naxwazin li vir kar û fêdeya qerfa rêz bikin. Kar û fêda fasûlyan çî be ya qerfa jî ew e. Em dixwazin qerfa bikin, kesên din bikirînin û bi kenîna wan re bikin ku bîponijîn. Ya girîngtir ew e ku, em têbîgihîjîn û karibin qerfa bikin û bi ronakbîrî qerfa biferikînin. Em tahmulkirina rexnegirtinê nişan bidin. Ev jî merdên ji bo kesên demokrat in. El-hamdulahu û şikir, ronakbîrên me têra xwe nesib jî demokratîyê negirtine. Gelê me xwediyê van adetan e ku, kirina qerfa û tiştên din tahmul dike, lê qapûdirêjîn me van tiştên xweş tahmul nakin û naxwazin tahmul bikin. Tahmul kirin û nekirina wan, me enterese nake. Me rahiştiyê Zengilê xwe û em ban hemû kesî dikin. Emê kêmasiyên xwe û ya girîngtir, li gora barê xwe perçan ji parçên çandîya kurdî derxin ber ronîya rojê. Ji ber vî awayî gavên me yên pêşî, nivîsandin û weşandina qerf û henekên Kurdan e. Em bawer in ku, wê kevir û rexne li me bibarin. Lê ev kevir û rexne girtinên baş wê bibin fêre ji bona kar û xebata me. Lê emê rîya xwe bidomînin. Bila yêzdanê pak li pişt kesên nexwedî tahmul, rexnegirtin û qerfa, be. Em çî bêjin!

Emê hînekî jî di derheqa kowarê de hîn agahdariyan di hundirê dema weşandinê de bidin:

Kovar, xwedî çend şertên bingehîn e. Hûn karin van şertên bingehîn di rûpela kovariya talî (paşî) de bibînin. Biryara weşandin û belavkirina kovarê ji du mehan carek e. Kadroyên me yên profesyonel tunene û ji xwe em nexwedî redaksiyoneke tîkûzin. Di hundirê dema weşandinê de emê bixebitin da ku, em

redaksiyoneke serbixwe (bê alî) hilbijêrin. Domandina kovarê ano ji bo ku her car derkeve, bi çêkirin û avakirina redaksiyonek serbixwe ve girêdayî ye.

Rûpelên kovarê û redaksiyona me jî her kesê hunermend û jêhatî re vekiriye. Bi şertên ku ew kes kesên giha-yî û demokrat bin û demokrat bînen din. Hinek jî çirok û qerfan em bi xwe peyda dikin, lê çirokên nava gel pirtir in. Bêyî ku, sansûr bibin, emê wan çirokan bi zimanê gel bêjin û binivîsin. Ji vê yekî em li benda alîkariya we ya bi her awayîne.

Lê em bawer in, di dema weşandina kar û xebatê de, emê kêmasiyên xwe hêdî hêdî kêmkirî bikin. Ev jî wextekî dîr û dirêj distîne. Ya baştirin ewe ku, em karibin hejmarên karikatûran zêdetir bikin.

Rûpelên hejmaran hindik in, di nava demê de emê xebata xwe ji bo zêdetir kirina rûpelan bikin. Serketina van tiştan bi alîkarî ya mirovên din, bi alîkariya rêxistin û bîr û baweriyên din ve jî girêdayî ye.

Belê karê me zehmete, zor e, ji ber ku cara yekemîn dest diçe ser babeteke nû. Belavkirin û neweşandina qerfan kêmasiyek girîng û mezin e. Û di destên me da gelek rê ji bona berhewdana qerfan tune ne. Emê li gora qeweta xwe ji bona tîkîkirina van kêmasiya bikin. Emê bextewar bin ku, em karibin çandîya xwe ya qerfa û adetan xwe ber û pêş bibin. Yên mayî ne girîngê...

Dîwarên qalind ji nava xwe rakin, çepelan hilweşînin!.. □



**TÎŞTEKI TÊFIROTIN NE-MAYE!..**

Li gora nûçen talî ku gihan me Mirze ÖZAL bi awayekî wiha tev tûcarên Ewropayê û hinek karbides-tên di merteba bilind da di odekî reş li otela Hiltonê bi şiklekî suret hate girtin.

Posên xweş dan e, di bin çim û lingê wan da heyvanê tayê mûya tunebû.

Ji aliyê nûçevanê me hate dîtin.

Ji Stanbolê/Zinarê AGIR Agahdar dike.

**MEŞEK MEZÎN**

Meşek mezin li bajarê Urfa çêbû. Ji hemu bajarên Kurdistanana bakur hatin bajarê Urfa. Meşê destpekin û hemuya bi hevra bankir:

-Bimre faşizm. Tûrkes kûçkê reş!

İsotçiyekî ji Urfa neşikî kesên ku dimeşîyan bû.

-Ev ji bona çi hûn dimeşîyan bimre faşizm. Faşizm çi ye?

Yekî got:

-Faşizm zulme, zordariye bihatiye. Heger Tûrkes bê ser hûkum we Kurda hemuya bikuje.

İsotçî dîsa li xortê ku dimeşîya vegerand:

-Heger faşizm bê we isotê me kedexe bike.

-Na!


-We çixkoftê me kedexe bike?

-Na!

-Wê kurkê me kedexe bike?

-Na!

-E, me tijêye, dixwaze faşizm bê, dixwaze neye.



### XEMGÎN

Xemgin li nava bajarê Şamê bi hîst ku, Baasî guhê xelkê jêdikin û bi bazdan hat ku bê mala xwe. Li rê li hevalekî xwe ras hat. Hevalî wî jê pirsî:

-Çima tu baz dide, Xemgîn?

Xemgîn got,

-E ku sê guhê wan hebin Baasî yekî jêdikin.

-Lê sê guhê te tune ne. Tu ne hewce yî baz dide?

-Baasî pêşî yekî jêdikin û dûra di hejmarin bê çend guhê wan hene!..

### FARISÎ-NORWEÇÎ-AMERIKANÎ Û KURD.

Çar kes, Farisî, Norweçî, Amerikanî û Kurd li cihekî li ser masekê hatin dor hev, her kesî dest bi zîrek û jêhatina gelê xwe kir. Farisî dest bi **pesnê** farisa kir û got:

-Xali û geltên me li dinê deng dane, tu welat û gelî nikarin tiştên wiha giranbiha bihûnin.

Tu kesî ji yên din tiştêk negotin; Dor hate yê Norweçî û dest bi pesnê welat û gelê xwe kir:


-Jin û qizên me, bi spehî bûna xwe di dinê de bi nav û dengin, jina xweştir ewe ku, meriv xwedî jinek spehî be.

Dor dan yê Amerikanî. Yê Amerikanî dest bi zirt û fota kir û got:

-Parastinek (istihbarat) me heye ku, li dinê kî çi bike em zanin û li her cihî ajanên me hene.

Ewî jî ya xwe tamam kir û dor hat ser rebenê Kurd. E Kurd hinekî pojînî û dest pê kir:

-Me Kurda li ser xaliya Farisa î giranbiha kuta keçek spehî ji Norweç, bê ku xebera parastina Amerikî jê çê bibe.



### ATATURK U XORTEKÎ KURD

Ataturk rojekê çû bajarê Qersê. Xelk hatin li dora wî kom bûn. Ataturk nerî ku xortekî çav şîn û sipehî hat û rahişt destê wî.


Ataturk lê gelekî nerî û got:

-Dîya te qet hatiye Selanîkê?

Xort lê nerî û got:

-Na! Dîya min nehatiye Selanîkê. Lê bavê min du-sê caran hatîye.

### KAHPİKÊ HEMDEM, LAVÊ MISTO.



# derziyê di çavên xelkê

# sûjînê di çavên xwe rake!



### QATIL OLIGARŞÎ

Patnos qezekî bajarê Agrî ye. Li Patnosê rojekê meşek ji aliyê HER-RE hatçêkirin. Kesên ku ketûbûn meşê, hemûya bi yek dengî bandikirin:

-Qatil oligarşî! Bimre oligarşî!  
Ê gundî jî nizanibû bê oligarşî çiyê. Ji yekî li dora xwe pirsî û got:

-Evana ji kîjan onbaşî re dibêjin qatil?

Ê dora wî lê vegerand:

-Weleh nabêjim bê kîjan onbaşî ye. Lê ji sedî sed ji onbaşiyê gundê me re dibêjin. Ji ber ku onbaşiyê me pir zulûmkare. Navê wî jî Kemal e.

Gundiye belengaz jî, xwe berda nava meşê û bi çen gundiyan hevalên xwe re bankir:

-Qatil Kemal onbaşî. Bimre Kemal onbaşî.

Polis hatin ew gundiyan belengaz girtin û birin qereqolê. Îfada wana girtin û şandin ba hakim. Hakim girtina wana xwest û xistin hepsê gundiya ji qerdiyan pirsî:

-Ji bona çî em xistine hepsê?

Qerdiyan got:

-We dev avetiya Kemal Ataturk. We şerefa wî şikandîye. Kemal Ataturk ne onbaşî bû. Serokê Komara Tirkiye bû.



Hakim pirsî:

-Tu çend saliyê?

-Ez 77 salî me!

-Ne fedîye ku tu di vî emrî de tirimpêla didizê?

-Dema ez xort bûm tirimpêl tune bûn mîrze hakim!

Nêçîrvan ji neçîrê hat mal, jina wî bankir û got:

-Kanî qey te tutiştêk negirt

-Belê min girt.

-Ka te li ku daniye? Li depo ye?

-Na, li nexweşxanê radizê.


-Axa yê min radyo min Erivanê nakişinê. Gelo tu zanê çî kemasiya wê ye.

Smail axa got:

-Fîşa wê têxe ..zê diya xwe, wê xweş bikişîne.

Keçunê û Smail axa

Keçunê jinek mi tirb bû û mala xwe havinî bar-kiribû hatibû gundê Darê. Axa-yê gund Smailê Xelil jî pir hene-çekî bû. Lawê Keçunê xwedî radyokê bû. Evaradyo dengê Erivan baş ne dikîşand. Sibehê lawê Keçunê rabû û berê xwe da oda Smail axa si lav li cemaetê kir û rûnişt, ji Smail axa re got:



KALÊ NEMRE BIHAR TÊ;  
PÎRÊ NEMRE ADAR TÊ

### ENDAMÊ HELBIJARTINA BAJARÊ URFA

Dibêjin tirba hazretê Ibrahim li bajarê Urfa ye. Li bajarê Urfa mizgeftê (camî) û goleka heye, jê re tê gotin, mizgeft û gola hazretê Ibrahim, di golê de masî nin pir mezin hene, girtin û xwarina wan masîya guneh û qedexe ye. Demakê li bajarê Urfa helbijartina belediyê dest pêkir. Yekî ji bajêr endametiya xwe nişan da, ji bona ku xelk dengdana xwe bidinê; wîna weke gelek kesên bê şeref propaganda xwe bi derewa dest pêkir û got:


-Ger ez bêm helbijartin, ezê gola hazretê Ibrahim bibim ser kelehê (kale).

Xortekî jî bi mereq jê pirsî:

-Tê çî bikê ji masîyan?


Endama helbijartî lê vegerand û got:

-Ezê wan masîyan jî bigrim û texim ..zê diya te.



ŞEV E REŞ E  
ŞOV E REŞ E  
MÎYE QER E  
BERXÊ BER E  
ÇAVÎ ZER E  
NOQÛTA XWÎN E  
SER E!

# DILANA BI ÇAROX



HEVAL

PARLEMANTO (federasyon) YA ME LI SWED

Beşir Midîrê dibistana pêşî bû û jê re Beşir xoce dihat gotin. Beşir xoce pir qelew bû û zikê wî wek yê gayekî mezin bû. Lawikek Beşir xoce 5 salî hebû û herdem bi bavê xwe re dihat dibistanê. Rojekê Mamostê dibistanê hemû li dora Beşir xoca kom bibûn. Lawê wî jî wê rojê li ba wî bû. Ji nivşekê lawê wî got:

-Zinêkê te ji bona çi wiha mezin e, çi di zikê te de ye yabo?

Beşir xoce bi awir tûj li lawê xwe nerî û got:

-Gû tê de ye bê terbiye!

Lawik dîsa lê vegerand:

-Te kengî evqas gû xwari

ye yabo?

AGIRÊ SERÊ MÎN KE-TIYE, TU JÎ FIRÎKÊ XWE BER DÎKELÎNÎ.


Lawkê male ji diya xwe re got:

-Yade xuyaye cînarê me ê nûh pir feqîrin.

-Ji bona çi? Tu ji ku zane lawê min?

-Ji ber ku zaroka wan ya biçûk weraqek daqurtand wana kiri dinya li hev xista!!

# MUHACIRÊ LI EVRUPA.



HEVAL

ZEBEŞÊ DIYARBEKIR  
Wextekî paşe ferman dide:

"Bila kes tiştan li ser e-reban nefroşin, ez dengê kesî nebihîzim"

Rojekê leşgerên paşî yekî bindeqfiroş digirin. Radibin wî digirin û dibin ba paşê.

Paşe ferman dide:  
"Van bindeqan têxin wî heta ku, ew pê bimire!"

Radibin bindeqan teva dixin mêrik heta ku, ew dimire.

Rojekê cardin leşger yekî pirteqalfiroş digirin. Leşger bi çepê wî digirin û dibin pirteqalfiroş qet xwe aciz nake û tîqtîqa wî ye dikene. Leşger ecêb mayî dimînin û jê dipirsin:

-Kuro tu çima dikenî? Malxirab te di me yek bi bindeqan kuşt, îcar ya te pirteqal e!!

Pirteqalfiroş got:  
-Ma ezê çima nekenim! Wa hevalê min Ehmed bi zebeşê Diyarbekir hatiye girtin!!!

BRÎNDAR

## NAKOKIYA ŞAMIKAN

Adaptation

Hesenê METÊ

Rojekê sê merivên reben lî hev rast tên û bî hev re dibin heval. Dî zîman de jî, ne wek-heviyek dî nav wan de heye. Jî ber ku her yek, jî navçeyên cuda cuda ne. Bes dî hinek tiştan de jî hev du fahm dikin. Lê dîsa jî, biryara hevaltîya xwe distînin ku biçin dereke xerîb û lî wir jî xwe re bixebitin.

Tûr û destmalên wa yên nên dî piyên wan de, dikevin rê û dîçin. Bî qasî danekî rê dîçin, dû re lî bin sîya darekî rûdînin ku nanê xwe bixwin. Dî nava çelê havînê, zevî hîşk û hola, dînya dîkele...Her sê jî nanê xwe jî tûrên xwe derdixînin, datînin ber xwe lê, bes nanê tîsî ye. Nanê her sê yan jî, bê pêxwarîni ye. Bî qederekî lî hev dinêhîrînin; dû re dest bî xwarîna nên dikin.

Çend parî nanê tîsî davêjin devê xwe lê, soxe naçe xwarê. Lî vê rasta çolê bêhn lê tengdibe, qırık lê zîwa dîb e...û hustûyên wan lî wir dî ber de tê.

Pîştê qederekî, kalek dî wê derê re derbas dibe. Kal bala xwe didiyê ku sê xortên nelî-serxwe bê hemd xwe dî ber tûrê nanê xwe yê tîsî re dirêj kîrînin. Kal gelek ber van xortan dîkeve û dî ber wan de pîr û pîr dîşewute. Dî cî de destên xwe dixê ber pîştê xwe ya rengo reng, bî qasî çend mecîdîyan derdixê û dîde wan ku jî xwe re pê pêxwarîniyê bîstînin. Xortên belengaz jî, bî vî ya gelek kêfxweş û dîlşa dibin. Pîştî ku kal jî wir dîçete û dîçe, ev lî hev dîçivin ku biryara kîrîna tişteki bîstînin.

Jî wan yek; "Dîvê em bî van dîrava; jîbo pêxwarîniyê şamikan bîstînin ku, ev nanê me yê tîsî dî qırîka me de biçê xwarê." dibêje.

Jî wan yekî din, bî hêrs "Na, na...nabel! jî xêndî bacanê sor ez tişteki jî, naxwîm." dibêje.

Û yê din xwe hîldavêje û dibêje: "Naha bî-rakno! Dîvê em tiştên zîvîstanê, lî zîvîstanê û yên havînê jî, lî havînê bîxwin. Ma dî havînê de tutiştêki jî fîringîyê xweştir heye lî vê havîna germ û lî vê rasta hîşk...?"

Yê berê dîsa xwe bî xwîna mêrekî davêje wan û: "Hevalno! Bî rastî jî; jî xêndî şamikan

tu tişteki bî kêrî vî nanê me yê tîsî nayê. Vê-ca ev çî bacanê sor û fîringî ye, we xîstîye serên xwe?"

Yê ku bacanê sor ebram dîke: "Naha ku mafê mîn jî dî vî pûlî de hebe; ez jî ya xwe danayê xwarê û ez bacanê sor dîxwazîm...ez tu şamîk û fîringîyan jî nas nakîm."

Yê ku fîringî dîxwest jî "Ku em parîki ber bî ilmê vî tiştî biçin û bîfîkîrînin; pêxwarîniya havînê û yê herî baştir, fîringî ye. Hemî êlên dinê lî havînan fîringîyan wek pêxwarîniyê bî kar tînin. Ez nîzînim...naha hûn çîma bî bacanê sor û şamîkan lî hemberî îlîm derdîkevin."



Her weha, yek heft û yek heşt dibêjin; tu yek jî, yê din fahm nake û bî gura wî nake. Meleheza wan gelekî ber xwe dîde. Yek dî bin yê din de namîne û êdî rewş dîgîhîje daraxek wîsa ku, bî çî û kevîran ber hev du re bîzdî-dî...Ku bî qasekî din bîma wê serê lî hev perçe bîkîrîna. Lê Xwedî nan dabû parî ber gerandî bû ku sîwarek dî wir re derbas dî-bû. Sîwar bala xwe berdayê ku çî bîbîne; sê xortên bî dest û pî rabûnin, xwe bê ronî dîkîşî-nî hev. Sîwar bêyî ku jî wan "çî ye...çî teba ye? " yê pîrs bîke; dî dest de jî galegalên wan dîfahme ku ev xortna jî derên cuda cuda nînin; loma hev du na fahmînin. Sîwar hêdîka jî hespê xwe dadîkeve û xwe dîgîhîne nava wan.




Pîştî ku xort jî çîroka xwe jî sîwar re dî-bêjin; sîwar lî wan dîzîvîrîne (bî pîşîrînin) "Xort-no! Dî esas te hûn hemî jî, mîna hev û yek tişteki dîxwazîn û dibêjin, lê hun jî hev fahm nakînin. Şamîk, bacanê sor e û bacanê sor jî fî-ringîye." dibêje. Her weha ev rewşa wan, jî hêlekî dibe dîlşewutîni û jî hêlekî jî, jî bo wan dibe pêkenînek. □





# zi dinê

Miodrag VELICKOVIC



Murat ÇEKÇEOĞLU

Claude SERRE

TEORIYA SÊ DINE!

Sal, meh û roj der-basbûn, şoreşgertî û teoriyên ji bona rizgariya netewî û civa-ki hatin dîtin. Hinek şoreşgerên Kurdistanê jî bi dîtina teoriya sê dinê dest bi kar û xebatên xwe yê siyasî kirin. Ketin nav kar-ker, gundî û xwendakaran. Li ser teoriya sê dinê, kovar, pirtûk û rojname derxistin û belavkirin. Teoriya sê dinê di destên xwe de kirin çekek mezin. Lê sed mixabin ku wan çekan piştî sala 1980 i nema mecal dît ku bê bi karanîn, hukme leşkerî hat û xebat hemû qedexe kir. Polîs û leşker der ketin gund û bajaran, pirtûk û rojname dan hev û kesên ku di-xwendin avêtin heps û zindanan. Leşker û polîs bi dû nêçîra pirtûkan ketin, li gundekî li mala gundîyekî belengaz, pirtûkek li ser teoriya sê dinê girtin, destên gundî xistin qeydê û teslîmî dadgeha leşkerî kirin. Hakim ban yê gundî kir: -Bêje! Bê dinya sê-min û teoriya sê dinê çi ye? -Hakim Beg! Welehî tiştên ku ez dizanim û quran jî dibêje; du dinya hene, ev dinya ew dinya. Lê dinya sêa û teoriya sê dinê min qet nebihîstî ye.



MESELE Û METOLOKÊN KURDÎ



- 1-Agir berdeyî-bîna bîso jê nayê.
- 2-Agir ber piyê wî dibe av.
- 3-Agir davê devê xwe, dibê: "Hajpê nînim"
- 4-Agir girtibû mala yekê, yekê ser û pê li ber dikizirandin.
- 5-Ar di qutikî kevndaye.
- 6-Agir qoncdane.

Jinik çû dadgehê û ji hakim re got:  
 -Ez dixwazim ji mêrê xwe berdîm.  
 -Ji bona çi?  
 -Ji ber ku ew her şev li meyxana digere.  
 -Qey ew gelek araqê vedixwe.  
 -Na! Ew li meyxanê li min digere.

di hejmara pêşîya me de

- QUNCIKA XEYBETÊ
- STÊRKA (FALÊ) WE
- DI NAV NENÛKÊ DA



## prensîbên me



REXNEGÎRTÎN HEYE, REXNELÎXWEGÎRTÎN TUNEYE!



REXNE LI HEMÛ KESAN TÊN GÎRTÎN  
HÊRSKETIN HEYE, DAXUYANÎ KIRIN TUNEYE!



EMÊ TIMÎ ŞÛJÎNÊ DI XWE RAKÎN  
KEN DÎBE GIRÎ NABE!



JI DU MEHA CAREKÎ DERDIKEVE, BELKÎ JÎ DERNEKEVE  
SEBIRKIRIN HEYE, MERAQ KIRIN TUNEYE



NIVISÊN BÊN, BÊ SANŞÛR TÊN ÇAP KIRIN  
QEST HEYE, NAVNIVÎSANDIN TUNEYE!



KOVARA ME NE MALÊ BAVÊ KESÎ YE  
DEMOQRATBÛN HEYE, DÎTINA TENG TUNEYE!

**NEXWÎNIN  
NEDIN XWENDIN!**

LÊ TENÊ BÛ KARIKATÛR  
PÊKENÎNÎN XWE ALÎKARIYA  
ME BIKIN.  
HÛN DIXWAZIN QET NEKIN!!